Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1054 | 5-Nisan-2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Cotyarên Balekayetî: Sermaya îsal berhemên baxçeyên me tûne kir, hikûmet jî guh nade me

**Cotyarên sînorê Balekayetî destnîşankirin ku tevî ku ew li ser hikûmeta Herêmê ne lê bi ti awayî hikûmet guh nade kerta çandiniyê û wiha gotin: "Îsal ji ber di werza biharê de hatina berf û sermayê li herêmê, ziyanek mezin gihand baxçeyên cotyaran û hemû şitlên ku pişk dabûn hişkbûn û serma birin."**



Her wiha Hogir Ehmed ku yek ji



Li herêma Balekayetî zêdetirî 36 hezar û 915 donim zeviyê çandiniyê heye. Salane zêdetirî 5 hezar û 100 cotyar tê de kar dikin. Her wiha li gorî bîlançoya Çandiniya Çomanê, salane 396 hezar û 393 ton berhem tê bi destxistin.



Piştî hatina pêla dawî ya befir û sermayê li navçeyên cuda yên Herêma Kurdistanê, ziyanek mezin bi rez û baxçeyên cotyarên Balekayetî ket. Weke cotyarên herêmê bi xwe dibêjin berhema îsal ji ber sermayê beriya ku bigihêje hişk bûye.

Yek ji cotyarên herêma Balekayetî Mecîd Hisên di derbarê mijarê de ji Rojnews'ê re axivîn û wiha pê de çû: "Ev serma û bahoza vê carê hatî, ji ber ku ne di wextê xwe de hat, ziyanek mezin gihand cotyar û baxçeyan. Hemû dar û şitlên ku pişt dabûn, serma birin. Piraniya darên ku ziyan dîtine ku di demek zû de pişk û gul didin yên weke qeysî, kîraz, xox û hilû ku di dema barîna berfê serma birin û ew jî bû sedem ku hişkbûn û reşbûna berheman."

Mecîd Hisên di dewama axaftina xwe de wiha got: "Hikûmet ti giringiyê nade sektora çandiniyê û îhmal kiriye, ji ber ku Wezareta Çandiniyê û Hikûmetê ti hemahengî û alîkariya cotyaran nake, lewma pêwîste li ser metirsiyên bi vî rengî tezmînat ji bo me were dayîn û şîretan werbigirin.

cotyarên ku ziyanek mezin dihiştiye baxê wî diyar kir ku ji ber ku herêma wan herêmek sar û çiyayî ye berfek zêde lê bariye û wiha axivî: "Barîna berfê bû sedem ku pileya germahiyê bikeve bin sifirê de û sir û serma li herêmê bide ku ziyanek mezin hihand bax û berhemên li herêmê. Di çend rojên borî de avhewa germ bû, lewma dar pişkên xwe dan û ji bo berhemdayînê amade bûn, lê ji ber nazik bûn û serma jî dijwar bû raste rast hemû hişkbûn."

Hogir Ehmed bang li hikûmetê kir ku alîkariya cotyaran û baxçivananên herêmê bike û wiha domand: "Ger hikûmet alîkariyê nake, bila di dema gihiştina berheman de, li sînor hinardekirina berhemên ji derve rawestîne û ji berhemên xwemalî bawer be, da ku ziyanek mezintir negihije cotyar û baxçivanan. Ji ber ku salane bi milyonan dînar li baxçeyên xwe xerc dikin. Lê di dema gihiştina berheman de ji ber anîna berhemên ji derve, berhemên xwemalî bê qîmet dibe." **ROJNEWS**

# 'Parastina ajalan hevsengiya jîngehê misoger dike'

**Jîngehparêza Lûbnanî Mêrvet El-Dibis a ajalên li kolanan bê xwedî mane xwedî dike, destnîşan kir ku ji bo hevsengiya jîngehî divê ajal bên parastin.**

Jîngehparêza Lûbnanî Mêrvet El-Dibis a bal kişand li ser parastina mafên ajalan, anî ziman ku ji bo hevsengiya jîngehî divê ajal bên parastin.

Mêrvet El-Dibis anî ziman ku tevî ku rewşa aborî ya xirab ku li Lûbnanê tê jiyankirin ew karê parastina ajalan dike û got: "Mûçeya min weke mamosteyek rûniştî gelekî kêm e jî, lê ez bi hemû karîna xwe hewil didim ajalên berdayî biparêzim ez nikarim ajalek nexweş an birçî bibînim."

**'Divê mafê ajalan bê parastin'**

Mêrvet El-Dibis her roj 12 saetan di şopandina heywanan de diqedîne û dibêje: "Ez ajalên nexweş bi tenê derman dikim, nameya min ji bo hemûyan ku ajalan biparêzin ji ber ku ew jîngehî diparêzin û



hevsengiya wê pêktînin."

Di berdewamiya axaftina xwe de Mêrvet El-Dibis bal kişand li ser êrişên ajalan û got: "Gelek dewletên cîhanê rêbaza xefikan, cudabûn û berdanê bi heywanên berdayî re bikar tînin. Lê di Lûbnanê de pêknayê tevî ku sala 2017'an de li ser zagona ajalparêziyê îmze kirine. Gelek dewletên cîhanê cihên xwedîkirina ajalan ava kirine, gel jî dikarin heywanên berdayî xwedî bikin derman bikin weke heywanên malan li gel xwe bihêlin. Zagon di madeya 12'an de diyar kirî ku divê cihên ajalan bên avakirin. Lê mixabin ta niha tenê me li bajarê Bailbek de dîtî wan cihek ji heywanên berdayî re avakirine lê rewşa segên berdayî bi awayekî baş nayê çareserkirin, tên kuştin an jehirkirin bi madeya Lanît ya metirsîdar ku di qada navneteweyî de qedexekirî ye."

**Ajalparêzî wek mijarek bingehîn nayê dîtin**

Mêrvet El- Dibis destnîşan kir ku danûstandina bi mijara ajalparêzî bingehîn nayê dîtin û wiha pêl da axaftina xwe: "Em mirov in, di her boneyekê de çêlikên heywanan weke diyarî didin hevdu, lê dema mezin dibin berpirsyartiya wan hilnagirin, lewma tên xwedîkirin an tên firoştin. Ez hewil didim xwarinê deynim cihên ew heywan têde kom dibin dûrî mirovan, ava paqij jî datînim, hin cureyên balindeyan û qirikan jî tên li ser wê xwarinê kom dibin. Li mala min hejmarek heywanên astengdar hene, ez li bendê me xelk hewil bide wan xwdî bike hundir Libnanê an derveyê. Her wiha maleke min biçûk heye ez têde 15 pisîkên birîndar derman dikim û xwarinê didim û wan diparêzim." **JÎNHA**

Sudoku: Bersiv 63

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 2 | 4 | 7 | 5 | 3 | 6 | 8 | 9 |
| 3 | 7 | 8 | 9 | 6 | 4 | 2 | 5 | 1 |
| 5 | 9 | 6 | 8 | 1 | 2 | 3 | 4 | 7 |
| 6 | 3 | 9 | 5 | 2 | 7 | 8 | 1 | 4 |
| 8 | 1 | 2 | 3 | 4 | 9 | 7 | 6 | 5 |
| 7 | 4 | 5 | 6 | 8 | 1 | 9 | 2 | 3 |
| 4 | 8 | 3 | 1 | 7 | 6 | 5 | 9 | 2 |
| 2 | 6 | 7 | 4 | 9 | 5 | 1 | 3 | 8 |
| 9 | 5 | 1 | 2 | 3 | 8 | 4 | 7 | 6 |

Sudoku:Pirs 64

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | | | |
| 2 | | 3 | | 5 | 6 | | 8 | |
| | | | 8 | | 4 | 3 | 9 | 5 |
| | | | 2 | | | 5 | 1 | |
| 3 | 1 | | | | | | 4 | 6 |
| | 7 | 6 | | | 3 | | | |
| 7 | 3 | 4 | 9 | | 2 | | | |
| | 5 | | 4 | 7 | | 8 | | 2 |
| | | | | | | | | |


## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Dad | Edalet, hiqûq, dadmendî, qanûn, zagon, yasa. Dezgehên pêşengiya qanûnan dikin |
| Dadgeh | Ciyê biryarên qanûnî lê tên dayîn. Dezgeha biryarên qanûnî. Mehkeme |
| Dadger | Rêveberê/a dadgehê. Hakim |
| Darizandin | Vekirina dozê li yekî, dayîna dadgehê, berdadkirin |
| Doz | 1. De´we, daxwaziya darizandinê. 2. Daxwazî, armanc: Doza ma azadiya Kurdistanê ye. 3. Kêşe, pirsgirêk, mesele, mûşkîle |
| Dozger | Kesê ji dadgehê daxwaziya cezakirina kesekî dike. Dadpirs. |
| Mamoste | Bi taybetî kesê/a ku tiştekî fêr dike, yan jî hina perwerde dike. |
| Parêzer | Kesê/a ku tiştekî yan kesekî li dadgehê diparêze. Ebûqat, mûhamî |
| Xwendekar | Kesên karê xwendinê dikin. Bi taybetî li dibistanan. |
| Xwendevan | Kesê tiştekî dixwîne: Xwendevanên rojnameyê pir in |

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1054 | 5-Nisan- 2023 | www.ronahi.net/ku/

'YPJ'ê sembola jina azad e ' R2

# ROJBÛNA RÊBER APO VEJÎNA JIYAN Û JINA AZAD E



# Dayîkên Şehîdan: 4`ê Nîsanê roja vejîna gelên azadîxwaz e

Dayikên şehîdan Rojbûna Rêber Apo li tevahiya gelên azadîxwaz pîroz kirin û gotin, 4'ê Nîsanê Roja vejîna gelên azadîxwaz e, em ê li ser rêya şehîdan têkoşînê dewam bikin û Rêber Apo fîzîkî azad bikin.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Rûmeta Rêber Apo Şehîdin, ji ber ku di felsefeya wî de serbilindiyeke taybet hebû, Rêber Abdullah Ocalan wiha gotibû: "Şehîd rêberên me yên exlaqî ne." Di vê çarçoveyê de jî, dayîkên şehîdan ev fikra mezin nirxandin. Ji bo vê jî zarokên xwe feda kirin, tiştên li ser Rêber Abdullah Ocalan diqewimin şermezar kirin û di wê baweriyê de ne ku zayîna Rêbertî zayîna hemû gelan e.

Dayikên şehîdan ên bajarê Qamişlo dan zanîn ku 4`ê Nîsanê vejîna gelê Kurd û tevahiya gelên azadîxwaz yên cîhanê ye. Herwiha banga bilindkirina têkoşînê ya ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo kirin.

**'4'ê Nîsanê Roja zayîna hemû gelan e'**

Dayika Şehîd Agirî Fatima Ebdullah, 4'ê Nîsanê li tevahiya gelên herêmê pîroz kir û got: "4'ê Nîsanê ji bo gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwedî wateyeke kûr e, herwiha ev roj ji bo tevahiya gelên azadîxwaz jî girînge."


Fatima jî wek gelek dayîkên şehîdan, ku zarokên xwe ji bo parastina xaka welat tevlî refên azadiyê kirin e, li ser fikr û felsefeya Rêber Apo fêrî berxwedan û têkoşînê bûye. Fatima weke jinên din yên ku bi ramanê Rêber Abdullah Ocalan ve girêdayî ye û wiha got: "Demokrasiya Rêbertî gelek her tişt guhertiye, mafê jin û hêza jinê derxist e hole, herwiha hişt ku jin bi îradeyekî pir mezin li



cîhanê hat belav kirin. Gelê kurd







beramberî desthiledariyê tekoşînê bike."

Fatima wiha axavtina xwe berdewam kir û got: "Felsefeya Rêber Abdullah Oclan, ne tenê ji kurdan re dihat belav kirin, herwiha felsefeya Rêber Apo ji bo hemû gelê ji mafên xwe bêpar bû, lê Rêber Apo ew bi rêxistin kirin.Têkoşîn kir da ku jin, ji bidestiyê û adetên kevnar rizgar bibin."

Fatima axaftina xwe wiha bi dawiya kir û got:"Roja 4`ê nîsanê jidayikbûna hemû gelên bindest e, em bang li civaka û dewletên navneteweyî dikin, ku ji rêbazên hovane yên dûrî mirovahiyê berdin. Em roja 4`ê nîsanê, wê bibe azadiya Rêber Apo a fîzîkî.

**'Em`ê azadiya fîzîkî a Rêber Apo misoger bikin'**

Dayika Şehîd Hebûn, Sewriya Salih jî derbarê rojbûna Rêber Apo axivî û got: "Jidayikbûna Rêberê Gelê Kurd, platforma mirovahiyê ye, ji ber ku Rêber Abdullah Ocalan çareseriya pirsgirêkên mirovî yên wekî demokratîk, pirsgirêkên azadiyê, herwiha fikr û nêrînên xwe pêşkêşî tevahî cîhanê kir. Em`ê ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo têkoşînê bilind bikin. Em bang li hemî saziyên navneteweyî dikin, ku ew tecirîda li ser Rêber Apo tê meşandin, bê rakirin. Pîrozkirina Rojbûna Rêber Apo wê bibe ningeha azadiya gelan."

**'4'ê Nîsanê Roja Ronahiyê Ye'**

Dayika Şehîd Kendal Şikiriya Ebas, ew jî di derbaeê 4`ê nîsanê de diyar kir ku rojbûna Rêber Apo Rojbûna tevahî gelan e û wiha got: "Roja 4`ê Nîsanê roja azadiyê ye, ku gelê kurd hatibûn tune kirin û nedihatin naskirn, herwiha di 4`ê Nîsanê de riya azadiya gelê kurd zelal bû, gelê kurd ku bi tiris daxwaza mafê xwe, zimanê û nasnemeya xwe dikir, Piştî derketina Tevgera Azadiyê serî rakir û derbên giran li dagirkeran dan.

Sewriya dawiya axaftina xwe de wiha got:"Em bang li gelê Kurd ê welatparêz û gelên cîhanê dikin ku tecrîda a li ser Rêber Apo tê meşandin, bişkînin û têkoşînê bilind bikin."

# 'YPJ'ê sembola jina azad e'

Norşîn Sîno /Qamişlo

**Jinên bajarê Qamişlo salvegera damezrandina Yekîneyên Parastina Jin (YPJ), herwiha rojbûna Rêber Abdullah Ocalan pîrozkirin û gotin, bi felsefeya Rêber Apo YPJ'ê hat damezrandin û bû sembola azadiya jin.**

Bi derketina Tevgera Azadiya Kurdistanê re, herwiha bi fikr û felsefeya Rêbe Apo, jina Kurd pêşengiya jinên cîhanê yên azadîxwaz kir û li hemberî desthilatdariyê û zihniyeta zilam têkoşîneke bê hempa meşand. Piştî Şoreşa Rojava û bi saya têkoşîna YJA Starê Yekîneyên Parastina Jin ( YPJ) hat damezrand û bû sembola azadiya jin .

Derbarê salvegera 10'an ya damezrandina Yekîneyên Parastina Jin ( YPJ) Jinên bajarê Qamişlo ji me re axivîn.

Jina bi Navê Şevîn Xelîl ya ji bajarê Qamişlo diyar kir ku jinên bakur û rojhilatê Sûriyê hêza xwe ji YPJ'ê digre û got: "Ez wek Jineke Kurd YPJ'ê hêz û sembola xwe dibînim. Dema em hêzeke jin bi cudabûyîna û xweşikbûna wan li hember xwe





dibînin , em hêzê û cesaretê jê digrin , ji ber vê yekê em wek jin bi giştî hêzê ji wan digrin"

Şevîn destnîşan kir ku YPJ'ê ji bo azadiya tevahiya jinên cîhanê têkoşînê dike û wiah domand: "Bi felsefeya Rêber Apo YPJ'ê bû yekem hêza jin di cîhanê de, wan tecrîbeya xwe ji YJA Starê girtin û bûn pêşengên jinên cîhanê. Herwiha şoreşa jinan di cîhanê de bi destê YPJ'ê destpêkir û li cîhanê tevî belav bû. Ez serkeftinê ji hêza xwe re hêza jinê YPJ 'ê re dixwazim , her wiha nameya min ji bo wan ew ê herdem li pêş bimînin ji ber ku em bawerî û pêşeroja xwe di wan de dibînin ".

Li ser heman mijarê jina bi navê Hesîna Ehmed ya ji bajarê Qamişlo Roja 4'ê Nîsanê , roja damezrandina YPJ li hemû jinên cîhanê pîroz kir û diyar kir ku damezrandina YPJ di roja rojbûna Rêber Apo de ji bo jinan xwedî wateyeke pir mezin e û wiha domand: "Ez vê roja giranbuha roja damezrandina Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) , ku di roja rojbûna Rêber Apo de de ye, li jinên Kurd,Ereb,Suryan,Aşûrî û hemû jinên Cîhanê pîroz dikim , damezrandina hêzeke jin di vê rojê de wateyek pir mezin dide me jinan, ji ber ku bi fikr û felsefeya Rêber Apo jin bûne pêşengên cîhanê, herwiha derfetên pir mezin ji wan re peyda bûne ku kar û xebatan bikin."

Hesîna Ehmed xaftina xwe wiha qedand: "Ji ber ku di her qadan û aliyan de jin wek kole dihat bikaranîn û zilm kli wan dihat kirin, YPJ'ê hat damezrandin û ji tevahiya jinan re bûn pêşeng.

Hesîna Ehmed axaftina xwe wiha qedand: "Destpêkê de em parastvanê rûmeta me silav dikin û dubare pîrozkirina roja damezrandina YPJ li xwe û wan dipijînin û ji wan re dibêjin, em xwe bi we dibînin, hûn sembol û nîşana jinên kurdin , we hişt ku cîhan matmayî bimînin ku hinek wek jina kurd li hember dijminan şer dikin , em bi we serbilind in."



# 'Rojbûna Rêber Apo Rojbûna mirovahiyê ye'

Hunermendên bakur û rojhilatê Sûriyê diyar kirin ku 4`ê Nîsanê ji bo gelên azadîxwaz bû çiroska azadiya gelên Rojhilata Navîn û gotin, Rojbûna Rêber Apo rojbûna mirovahiyê ye.

**Birûc Resûl/Qamişlo**


Di Nîsana sala 1949'an de, zayîna jiyaneke nû li ser xaka Kurdistanê vejîn bû. Navê vejîna nû rojbûna Rêber Apo bû. Rojbûna Rêber Apo, di rastiya gelekî li ber pençe qirkirinê bû, hêza wateyê û jiyana bi rûmet afirand. Rêber Apo, di temenê zarokatî de jiyan xiste ber lêpirsînê. Ji bo bigihêje bersiva vê lêpirsînê, nakokiyên mezin jiya û dev ji xwe gîhandina xeyala jiyana azad berneda. Rêber Apo, ji bo jina Kurd, gelê Kurdistanê û tevahî gelên azadîxwaz bû dîrok, hêvî û baweriya bi jiyana wekhev û azad. Bi rojbûna Rêber Apo re, li Kurdistanê, bedena ruh ji dest dayî ruh pê hat, hişa ku ji hebûn, cewher û evîna xwe ya jiyanê biyanî bûbû jinûve jîndar bû.

Hunermendên bakur û rojhilatê Sûriyê rojbûna Rêber Apo li tevahiya gelên azadîxwaz pîroz kirin, herwiha diyar kirin ku bi felsefeya Rêber, çanda gelên resen hat vejandin.



**'4`ê Nîsanê, roja azadiya gelan e'**

Şanoger Hanî Elhnî ku ji bajarê Reqa ye diiyar kir ku 4`ê Nîsanê roja azadiya gelan e û wiha got: "Rojbûne Rêber Apo, roja jidaîkbûna azadiyê ye, roja hebûne gelane. Rêber Apo ne tenê ji bo azadiya gelê Kurd têkoşînê dike, ji bo tevahiya gelan têdikoşe. Felsefeya Rêber Apo riya çareseriya tevahiya pirsgirêkên Rojhilata navîne. Herwiha 4`ê Nîsanê ji bo me roja demokrasî û bingeha wekheviya gelan."





**'Bi rojbûna Rêber Apo riya azadiya gelan ronî bû'**

Hunermend Baran Dil Bûhar di derbarê rojbûna Rêber Apo de wiha got: "Jidayîkbûna Rêber Apo di roja 4`ê Nîsanê de ye, kurd vê rojê wekî roja xwe dibînin, weke roja zanîn û ji dayik bûna xwe dibînin, Rêber Apo ji bo me jidayîkbûna gele û têkoşîna wî ji bo hebûn û azadiyê gele. Beriya ku Rêber Apo derbikeve, kurd di nava gelên derdorê de dihatin jibîrkirin û winda kirin, bi mirinê re rû bi rû mabûn, ji ber ku hemû serhildanên kurda hatibûn şikandin têk çêbûn,kurd bê ziman, çand û nasnama bûn, ku hedî hêdî tuna dibûn. Lê bi derketina Rêber Apo bû vejînek û coşek nû, herwiha ku kurd di şevek tarî seqem girtî de bûn, ku di rojbûna Rêber Apo 4`ê Nîsanê de, ronahî li ser kurdan derket, wekî ku kurd bê can û rih mabûn. Rêber Apo dibe rih û xwe derbasî gewdeyê gelê kurd dike."

Baran Dil Bûhar axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Rêber Apo gelê kurd pir bilind bi rêxistin û perwerde kir, gelê kurd zane kir, azadî derbasî dil û mêjiyê wan kir. Bi felsefeya Rêber Apo ne tenê kurd, tevahiya gelên azadîxwaz riya azadiyê dîtin. Rêber Apo hişt ku em bi fikir û ramanê xwe azad bibin, ku bû hêzek ji bo hemî kurdan li ber dewletên dagerkir daxwaza mafê xwe û nasnemeya xwe bikin. Eger Rêber Apo fîzîkî azad nebe tu carî Kurd û Kurdistan azad nabin."

# 'Şoreşa 19`ê Tîrmehê şano li Rojava vejand'

**Hemze Sêvo/Qamşlo**


**Mamosteyê metiriyala şano li zanîngehga Rojava Beşîrê Mele Newaf diyar kir ku piştî şoreşa Rojava perdeya tarî li ser şanoya kurdî li Rojava hat qetand û hunerea şanoyê hat vejandin.**

Şano hunereke mirovî ye û hêja ye ku were danasîn, şano di wateya xwe ya giştî de hunereke ku mirov an kesên şanoger bi riya wê raman,pirsgirêk û mijarên wêjeyî,zanistî, felsefî û hwd. Derxe holê û ji civakê bide xuyakirin.

Ev huner ji serdema Xwedawendê yûnanî Ziyos bi awayê dîlanê û rêûresmên olî derketiye û piştî wê êdî bû hunereke serbixwe bi şêweyê şanogeriya kilasîk ku bi awayekî helbestî dihat nivîsandin.

Li gorî agahiyên dîrokî şanoya nivîskî ya yekê ji aliyê şanonivîsê yûnanî Asxîlos e hatiye nivisîn. Asxilos di 524`ê berî zayînê jidayîk bûye û yekem deqên şanoyî ji aliyê wî ve hatiye nivîsîne. Hijmara deqên şanoyê ku wî nivîsandiye 90 deqin. Lê niha tenê 7 berhemên wî mane. Hêjayî gotinê ye ku berhema wî ya yekê û dibe weke deqa şanoyê ya destpêkê Piromîsiyosê Zincîrkirî bû.

Roja Şano ya Cîhanî jî, yekem car di 27`ê Adara 1962`an de, ji aliyê Desteya Şano ya Cîhanî ve hatiye destnîşankirin û di vê rojê de, komeşanoya bi navê Şanoya



Netewî hate pêşkêşkirin. Herwiha ji wê rojê û bi şûn de her 27` adarê cîhan bi giştî ji bo Roja Şano ya Cîhanî şanoyan pêşkêş dike û şahiyan li dar dixe.

Li cem gelê kurd jî, ji ber qirkirina çandî ya ku ji aliyê dagirkerên Kurdistanê ve li ser gelê kurd hatiye meşandin, gelê kurd derfeta pêşxistina şanoya neditiye û di şanoyê de heta astekê kêm maye.

Li Bakurê Kurdistanê tevî zor û zehmetiyan li ser vê hunerê hatiye rawestandin û hêjayî gotinê ye ku deqa şanoyî ya yekê bi navê Memê Alan bû û ji aliyê Ebdurehîmê Hekarî ve, di sala 1919'an de hat nivîsandin.

Li Rojavayê Kurdistanê jî rêjîma Baas bi tu carî nedihişt ku kurd di warê wêje, huner û zimanê xwe de kar bikin. Lê bi derketina Tevgera Azadiya Kurdistanê û piştî salên 80'î, xebata siyasî, çandî û wêjeyî li Kurdistanê ji nû ve vejîn bû.

Herwiha li Rojavayê Kurdistanê bi saya Tevgera Azadiyê hin komên çandî û hunerî hatin çêkirin, van koman jî di rojên Newrozan de şano pêşkêş dikirin.

Lê piştî Şoreşa 19'ê Tîrmehê ku ji kurdan û gelên herêmê re vejîneke çandî, hunerî, wêjeyî û zanistî bi xwe re anî, êdî pê re bingeha hunera şano jî li Rojava çêbû û tevî êrîş û derfetên kêm jî, şano bi awayekî berbiçav pêş ket, bi 10'an komên şanoyê û şanoger derketin holî û Mîhrecanên şanoyê salane tên lidarxistin.

**'Şoreşa 19`ê Tîrmehê hunera şano li Rojava vejand'**

Derbarê rewşa şanoyê li bakur û rojhilatê Sûriyê Mamosteyê metiriyala şanoyê li zanîngeha Rojava û endamê Komîteya Nirxandinê ya Mehrecana Şehîd Yekta Herekol Beşîrê Mele Newaf ji me re axivî.

Beşîr diyar kir ku bi destpêkirina Şoreşa 19`ê Tîrmehê li Rojavayê Kurdistanê , huynera şanoyê li Rojava bi pêşket û wiha berdewam kir: "Berî destpêkirina Şoreşa Rojava, şano bi riya komên hunerî di Cejnên Newrozan de li Rojava Kurdistanê dihatin pêşkêşkirin, lê ji ber ku hemû regezên şanoyî di nav xwe de nedihewandin em nikarin navê şano li wan bikin. Herwisa piştî şoreşa 19`ê Tîrmehê hunera şanoyê li Rojava cihê xwe girt û pêşket, yek ji van pêşveçûna hunerî di ware şanoyê de, lidarxistina Mîhrecana Şehîd Yekta



Herekol ya Şoyê ye, ev mîhrecan yekem car di sala 2014`an de hat li dar xistin û heya niha ji bo pêşxistina şanoya Kurdî gavên mezin diavêje. "

**'Tevî astengiyan jî, Şanogerî berhemê binirx pêşkêş dike'**

Beşîr Mele Newaf bal kişand ser asta şanogerî û astengiyên wê li Rojavayê Kurdistanê û wiha got: "Hunera şano li Rojava hêdî hêdî pabendî rêkûpêkiya huner şano ya navnetewî dibe. Mîhrecana Şhîd Yekta Herekol ya ku 6`emîn car li Rojavayê Kurdistanê tê lidarxistin, ji bo şanogeran derfetên pêşketinê diafirîne. Hêjayî gotinê ye ku hemû komên şanoyên yên Rojava û komek ji Rojhilatê Kurdistanê piştî nirxandin û taqîkirinê ji aliyê Komîteya Nirxandinê ya mîhrecanê hatin xelatkirin û ev yek bi xwe teşwîqê li cem şanogeran çêdike.

Mamosteyê metiriyala şanoyê li zanîngeha Rojava û endamê Komîteya Nirxandinê ya Mehrecana Şehîd Yekta Herekol Beşîrê Mele Newaf wiha axaftina xwe qedand: "Em weke parêzerên vê hunerê rastî gelek astengiyan tên yek ji wan jî êrîşên dewleta Tirk ya dagirker ser herêmên me ye, ev yek bandore li rewşa derûnî dike û şanogerên me ji karên xwe dûr dikevin. Herwiha dighêje asta ku penabr jî bibin. Rêveberiya Xweser bi Komên şano yên Rojava re alîkar e. Ji bo pêşkêşkirina baştrîn şanoyan li ser asta Rojava pêwîste alîkariyên madî û teknîkî ji komên şanoyan re bên pêşkêş kirin."


# Feqîr Ehmed çawa Ocalan nas kir

Feqîr Ehmed: Abdullah Ocalan ji me hemûyan bêhtir wî Kurdistan diparast. Wî behsa teoriya serxwebûn û têkoşîna çekdarî kir ji me re. Me siyaseta wî qebûl kir û em bûn hevrê.

**FIRAZ BARAN**

Feqîr Ehmed sala 1942'an li gundê Mizeynterê yê ser bi Pirsûsê hatibû dinê. Ev gund hema li ser sînor e û tenê kîlometreyekê dûrî Kobanê ye. Jixwe, dayika Feqîr Ehmed ji Kobanê bû. Xalê wî Elî Huseynî Midrisî şair û çîrokbêj bû. Bavê wî jî jê re çîrok û serpêhatiyên dirêj digotin.

Feqîr Ehmed jî bi van tesîran ji ciwaniya xwe ve dest bi nivîsandina helbestan kir. Helbesta wî ya pêşî jî sala 1963´an hat weşandin. Ew sala 1965´an weke karker koçî Elmanyayê bû. Ew li vir bû elektrîsyen û 6 salan di Riyên Hesinî yên Elman (DB) de xebitî. Hingê wî destek da hereketa Dr. Şivan. Wî temamê jiyana xwe destek da Tevgera Azadiya Kurdistanê. Wî ji bo Kurdistanê gelek helbest nivîsandin.






**Prof. Yasa ew û Ocalan anîn cem hev**

Prof. Îbrahim Yasa li Enqerê, Fakulteya Zanistên Civakî (SBF) damezrandibû û navdar bû. Prof. Yasa sala 1972'yan diçe Elmanyayê û sê hefteyan dibe mêvanê Feqîr Ehmed. Piştre ku Feqîr Ehmed sala 1976´an diçe Enqerê, dibe mêvanê wî. Hingê Abdullah Ocalan û Cemîl Bayik diçin mala Prof. Yasa û li wir Feqîr Ehmed wan nas dike. Axir, Feqîr Ehmed hefteyekê li cem Ocalan dimîne. Di hevpeyvînekê de ku Kakşar Oremar bi Feqîr Ehmed re kir û di Stêrk TV de hat weşandin, Feqîr Ehmed dibêje, "Abdullah Ocalan pirr teorîk bû. Ji me hemûyan bêhtir wî Kurdistan diparast. Wî behsa teoriya serxwebûn û têkoşîna çekdarî kir ji me re. Me siyaseta wî qebûl kir û em bûn hevrê. Tiştên wî behsa wan kir, weke guleke xweşkok di dilê min de cih girtin. Paşê em çûn Pirsûsê, qederê mehekê em li wir man. Wî di nava mehekê de milet birêxistin kir, Pirsûs guherî."

**CİWANİYA FEQÎR EHMED**

Piştî naskirina Ocalan, Feqîr Ehmed bû Apocî û weke alîgirekî tevgera PKK´ê jiya. Wî deriyê mala xwe ya li Kolnê piştî hingê ji tevahiya evîndarên doza Kurdistanê re vekir. Mala wî bûbû mîna Mala Kurdan. Wî Aram Dîkran, Şehîd Sefkan, Şehîd Mizgîn, Medenî Ferho, Seyîdxan, Xelîl Xemgîn, Şivan Perwer û gelek kesên din li mala xwe kirine mêvan. Aram Dîkran helbestên wî "Riya Kobanê", "Çûm Siya Darê" û "Ey Welato" kirin stranên navdar.

**BERHEMÊN WÎ**

Feqîr Ehmed 3 dîwanên xwe weşandin: Dîwana Reş I-II-III. Dîwana wî ya pêşî sala 1990´î hat weşandin. Dîwana Reş II di sala 1994´an, Dîwana Reş III jî sala 1998´an hatin weşandin. Ji bo navê dîwanên xwe jî wî got, "Em her di nava şînê de ne. Ji ber wê min ev nav lê kir. Lê di helbestên min de Kurdekî teslîm bibe nîne. Di helbestên min de berxwedan, têkoşîn, berdêlên giran, şehîd û nexasim jî serkeftinên PKK, asta têkoşîna jinên Kurdistanê heye."

Feqîr Ehmed çîrok jî nivîsandine yên weke Qehremanî Qedar (li ser Împeretoriya Med), Derweşê Evdî, Azapê Kose, Siloyê Zindê, Şêxmehrem, Berkelê Egîd, Keyê Sor, Borşad, Diz hin ji van in.

Feqîr Ehmed bi navê Doza Welat û Şerê Kurdistan, du roman jî nivîsandine, lê ev roman hîna nehatine weşandin.

**SERHATİYA NEXŞEYA KURDİSTANÊ**

Feqîr Ehmed, gava ku diçû Parîsê, her carê diçû serdana Kamiran Alî Bedirxan jî. Carekê wî nexşeya Kurdistanê ya ku Cemiyeta Miletan hazir kirî, dît. Bi tika û ricayê ew nexşe bire Elmanyayê û ji berê 5 hezar nusxe dan çêkirin. Wî ev nexşe bi karkerên çûn izna salê re şand Kurdistanê. Wî ji min re beriya wefat bike wiha behsa vê meseleya vê nexşeyê kiribû: "Nexşe gihiştin Bakur, Rojava û Başûr. Xelkê dida dest hev. Xelk bi wê nexşeyê gelekî şa bûbû."

Feqîr Ehmed di 81 saliya xwe de li bajarê Elmanyayê Kolnê 30´ê Adara 2023´yan wefat kir. Cenazeyê wî li gundê lê ji dayik bûbû, hat veşartin.

# Bexçeyê 4'ê Nîsanê li Qamişlo hat vekirin

**Di çarçoveya pîrozbahiyên Rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de, Bexçeyê 4'ê Nîsanê li taxa Hilêliyê ya bajarê Qamişlo hat vekirin.**

Bi boneya 4'ê Nîsanê Roja Rojbûna Rêber Apo, Saziya Malbatên Şehîdan û bi alîkariya Hevgirtina Hesarê, Bexçeyê 4'ê Nîsanê li taxa Hilêliyê vekir.

Ev baxçe pirtûxane,kafîtîriya û muzîxaneyekê di nav xwe de, dihewîne hêjayî axaftinê ye ku tev bi navê Rêber Apo ne. Herwiha bi sedên gul û dar tê de hatine çandin, dar bi du cureyên xwe di vî baxçeyî de hene yek jê yên normal in ango bêberhem weke darên Serû ku hejmara wan 70 dar e, yên din jî darên fêkî û bi berhem in weke darên Xurman, hejmara wan 4 dar in û yên Sinoberê jî hene û hejmara wan 70 dar e.

Di derbarê Rojbûna Rêber Apo û vekirina Baxçê 4`ê Nîsanê de dayika Şehîdan ya bi navê Rebîa Qewas ji me re axivî.








**'Rojbûna Rêber Apo vejîn e ji bo jinê û gelê kurd '**

Jina bi navê Rebîa Qewas,ku ew bi xwe dayika şehîdan e, diyar kir ku roja 4'ê Nîsanê vejîn e ji bo jinê û tevahiya gelê kurd û wiha dewam ki:"Di roja 4'ê Nîsana 1949'an de roka azadiyê li Rojhilata Navîn hat der û tariya şevên reş û bi tirs li ser hemû gelên bindest hat hilanîn, di vê rojê de Rêber Apo ronî da duniyayê, ji zaroktiya xwe ve bû xemxurê azadiya gelê xwe û herwiha ji bo têkbirina serdestiya ku li ser jinê ye xebata xwe berdewam kir heya ku bi serket. Em wek jinên azad li ser fikr û ramanên Rêberê xwe ne, sekn û karên ku em li Rojava û tevayî Kurdistanê îro ji bo jinê azadî bi xwe ye, ev jî bi saya Rêber Apo, jinên berxwedêr, YPJ, Gerîlayên azadîxwa û pakrewanên Kurdistanê ye. Em rojbûna Rêberê Apo li jinên azad, Malbatên Şehîdan û gelê kurd pîroz dikin û soz didin Rêberê xwe, ku em ê hertim li ser fikr û felsefeya wî bin, heta ku azadiya Rêber Apo ya fîzîkî bi dest bixin û Kurdistanê bi tevayî azad bikin."

**'Çandina daran azadî ye, ji felsefeya Rêber Apo ye'**

Di derbarê Rojbûna Rêber Apo û vekirina Baxçê 4`ê Nîsanê de dayika Şehîdan ya bi navê Rebîa Qewas rojbûna Rêber Apo pîroz kir û wiha axaftin xwe bi dawî kir:"Em weke dayikên Şehîdan Rêberê xwe bi dilxweşî û serbilindî di vê rojê bi taybet bi bîr tînin, netenê di hemû rojan de jî, herwiha lê pîroz dikin û bi fikr û felsefeya wî di vê rojê de jî bi hezarên daran diçînin. Ji karên balkêş yên ku îsal li bajarê Qamişlo hat kirin jî pirojeya ku Hevgirtina Hesarê bû, em weke Malbatên Şehîdan li ser vî karê bi nirx spasiya wan dikin û vekirina vî baxçeyî, Baxçê 4`ê Nîsanê pîroz dikin."



# XELATA YPJ'Ê DİYARÎ FERMANDARA PÊŞMERGEYAN HATE KİRİN

**Nûnertiya Kongreya Star ya Başûrê Kurdistanê bi boneya salvegera damezrandina YPJ'ê xelata rêzgirtinê diyarî fermandara pêşmergeyan ya YNK'ê Rêzan Reşîd kir.**

Nûnerên Kongreya Star li Başûrê Kurdistanê Roza Hesen û Silava Silêman bi boneya salvegera damezrandina Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) serdana biryargeha pêşmergeyên jin yên ser hêzên 70'ê li Silêmaniyê kir. Nûnerên Kongreya Star li Başûrê Kurdistanê di serdanê de xelata YPJ'ê pêşkêşê fermandara pêşmergeyên jin Rêzan Reşîd ya ser bi hêzên 70'ê (YNK) kir.



Fermandara pêşmergeyan Rêzan Reşîd jî 10'emîn salvegera YPJ'ê pîroz kir û got: "Jinên Rojava îspatkirine ku dikarin hemû jinan biguherin. Serkeftina beramber bi dijminê herî mezin yê mirovahiyê DAIŞ'ê îspata wêrekiya wane."

Fermandar Rêzan di dewama axaftina xwede got: "YPJ ji bo xebatên netewî û jinan xwe daye ber guleyên dijminan."

Di dawiya axaftina xwede jî fermandar Rêzan pîrozbahî li YPJ'ê kir û serkeftinê jêre xwest.

YPJ bi armanca têkoşîna bi El-Nûsra û DAIŞ'ê re di 4'ê Nîsana 2014'an de hatiye damezrandin. Niha li seranserê Rojavayê Kurdistanê û li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hezaran şervanên xwe yên ji pêkhateyên Kurd, Ereb, Asûrî-Siryanî û Tirkmen heye.

# YNK'Ê TÊKİLDARÎ AMBARGOYA DEWLETA TİRK DAXUYANÎ DA

**YNK`ê diyar kir ku rawestandina rêwîtiyên hewayî yên şîrketeke Tirkiyeyê ber bi Silêmaniyê ve karekî ne yasayî û hewldanek tevliheviyê ye û diyar kir "Em ê heta dawiyê piştgiriya xebatên çar parçeyên Kurdistanê bikin."**

Duh berdevkê Balafirxaneya Navneteweyî ya Silêmaniyê Hindirîn Hîwa Muftî ji Rojnewsê re ragihand ku şîrketa Turkish Airlines hemû seferên di meha Nîsanê ji bo Silêmaniyê, rawestandine.

Buroya 3 ya Yekitiya Nîştimanî ya Kurdistanê (YNK) ya Hewlêrê têkildarî mijarê daxuyaniye belav kir. Daxuyanî wiha ye:

"Em piştgiriya xebata her çar parçeyên Kurdistanê, pîrozbahiya Newroza Amedê û helwesta Bafil Talebanî ya li ser firotina nefta Herêma Kurdistanê ya ji aliyê şîrketa SOMO'yê ve dikin. Tirkiyeyê rêwîtiyên asmanî yên ji bo Silêmaniyê rawestandin. Ev ambargo karekî ne yasayî ye û hewldaneke tevliheviyê ya ji aliyê Tirkiyeyê ve ye ku dijî parçebûna Iraq, Herêma Kurdistanê û herêmên di bin kontrola YNK'ê de ye.

Ev biryar piştî gefa wezîrê parastinê yê Tirkiyeyê Hulusî Akar ya 2 roj piştî ketina helîkopterên hêzên li dijî terorê yên Rojavayê Kurdistanê hat. Wek gefeke rasterast li YNK'ê kirin û gotin ger piştgiriya PYD'ê bigihe heya asmanî û balafiran, divê li benda rawestandina esman jî bin."

# CİWANÊN GİRÊ SPÎ BANGA HESABPİRSÎNA Jİ XAYÎNAN KİR



**Tevgera Ciwanên Şoreşger a Sûriyeyê ya kantona Girê Spî radestkirina gerîla Harûn şermezar kir û bang kir ku hesab ji ajan û xayînan bê pirsîn. Her wiha soza mezinkirina têkoşînê da.**

Tevgera Ciwanên Şoreşger a Sûriyeyê ya kantona Girê Spî têkildarî radestkirina gerîla Harûn daxuyaniyek da.

Endamê tevgerê Mecid El Himêdî daxuyanî xwend. Endamên tevgerê li navçeya Eyn Îsayê û koçberên kantona Girê Spî tev li xwendina daxuyaniyê bûn.

Di daxuyaniyê de tevgerê radestkirina gerîla Harûn şermezar kir û destnîşan kir ku ajan ji vê bûyerê dixwazin bandorê li xeta berxwedanê bikin.

Her wiha tevgerê rola gerîla Harûn di parastina gel û axê de silav kir û diyar kir ku gerîla Harûn di nava HPG`ê de li hember dagirkeriyê şer û di hemû qadên berxwedanê de cihê xwe girt.

Di dawiyê de tevgerê bang kir ku hesab ji ajanan bê pirsîn û pêwîstiya mezinkirina têkoşînê û piştgiriya berxwedanê heta pêkanîna serkeftinê, destnîşan kir.

# ÊRİŞÊN DEWLETA TİRK ÊN Lİ SER ÇEPERÊN BERXWEDANÊ BÊ NAVBER DEWAM DİKİN

**HPG'ê bi daxuyaniyek nivîskî ragihand ku artêşa Tirk a dagirker ji hewayî û bejahî 25 caran êrîşî Herêmên Parastinê yên Medyayê kir.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê derbarê êrîşên ku ji aliyê artêşa Tirk a dagirker hatiye kirin, ev agahî da:

Êrişên ku artêşa Tirk a dagirker bi çekên qedexe kiriye:

Di 3'ê Nîsanê de bi çekên qedexe çeperên me yên berxwedanê yên li Sîdayê carekê hatine bombekirin.

Êrişên ku artêşa Tirk a dagirker kiriye;

Di 3'ê Nîsanê de qada Deşta Kafya ya Garê bi balefirên şer 3 caran hate bombekirin.

Di 3'ê Nîsanê de çeperên me yên berxwedanê yên li Çemço û Sîdayê bi helîkopterên êrîşê, obus, tank û çekên giran 21 caran hatine bombekirin."




# Parêzer Cunyet Caniş: Tecrîda Rêber Apo kiryareke dijmirovî ye

Parêzerê Rêber Gelê Kurd Abdullah Ocaln Cunyet Caniş diyar kir ku tecrîda li ser Rêber Ocalan kiryareke dijmirovî ye û got, divê her kesek ji aliyê xwe ve û bênavber derdorê xwe rêxistin bike û têkbirina tecrîdê û azadiya Rêber Ocalan ji xwe re bike karekî bingehîn.

**Navenda nûçeyan**

Hêzên kapîtalîst û desthilatdar yên komploger, bi plangeriyeke navneteweyî Rêberê Gelê Kurd Rêber AP, dîl girtin. Ev komplo di şexsê Rêber APO de, li ser gelê Kurd û gelên Rojhilata Navî bi peyman û hewldana planên nû yên qirêj dewam dike. Hêzên kapîtalîst, bi armanca tinekirina nirxên civaka azad, wekhev û jiholêrakirina Modernîteya Demokratîk, komplo pêş xistin. Rêber Apo, bi pêşxistina berxwedana dîrokî, bi heqîqeta avakirina civaka azad rastiya komplogeran pûç kir. Hêzên komploger, ji ber ku li hemberî berxwedan û têkoşîna mezin ya Rêber Apo, bin ketine, bihêrs in û îro Rêber Apo di nava tecrîdeke giran de digirin û ji nber qedexekirina hevdîtina wî bi parêzer û malbata wê re , ev 2 salin ku tu agahî ji Rêber Apo nehatiye girtin. Derbarê tecrîda girankirî ya li ser Rêber, nehiquqiya tecrîdê û xebatên parêzerên Rêber Apo, parêzerê Rêber Apo Cunyet Caniş ji rojnamey me re axivî





**'Tecrîda ser Rêber Apo dijmiroviye'**

Caniş diyar kir ku tecrîda giran ya ser Rêber Apo biryareke dijmirovî ye û wiha dgot: "Berî her tiştî divê em di serî de zelal bikin, tecrîda girava Îmraliyê ji sala 1999 an heya niha berdewam dike. Asta girankirina tecrîdê dem bi dem hatiye guhertin, lê mixabin wek biryarekî siyasî heya îro guhertinek esasî bi hêla çareseriyê de çênebûye. Navbera 1999-2015 sedemên fîzîkî didan nişandan, wek rewşa hewayê û xerabbûna keştiyê. Lê gor pîvanen qanunî û hiqûkî em nikarin yek ji van sedeman wek sedemên esasî an jî mirovî bi nirxînin. Piştê sala 2015'an heya niha jî dewleta Tirk edî hewce nabîne sedemekî an bi rêzê de an jî bi hiquqî bide nişandan. Piştê 2015'an dewleta tirk eşkere kiriye û daye nişandan ev tecrît ne qanunî, ne hiquqî û ne jî mirovî ye. Em jî vê tecrîdê wek biryarek siyasî digrin dest, li gor me ev biryar biryarekî dijî mirovahiyê ye û îşkence ye. Dewleta tirk di asta herî jêr de hem qanunên xwe hem jî peymanên navnetewî binpê dike."

**Xebatên parêzerên Rêber Apo**

Çaniş da zanîn ku ji bo rakirina tecrîda li ser Rêber Apo parêzerên Rêber Apo xebatên hiqûqî li Tirkiyê û derveyî Tirkiyê jî dan maeşandin û wiha domand: "Ji Ji bo rakirina tecrîdê heya îro wek parêzeran me xebatên hiqukî em di nava Tirkiyê hem jî di derveyî Tirkiyê de, li ser esasê peymanên navnetewî xebat meşandin. Di nava Tirkiyê de rê û rêbazên hiqukî dadgeha herî jêr de em destpê dikin û heya asta jorîn em serlêdanan dikin dema ku bersîvek neyînê derdikeve em serlêdanên xwe ji saziyên navnetewî dikin. Di nava saziyên an jî dadgehên Tirkiyê de me heya îro bi ti awayî biryarek nestandi ye. Ji ber vî yekê ye berê tecrît tenê li ser girava Îmraliyê bo û niha ser hemû zindanan ev yek wek qanûn tê meşandin. Li ser esasên serlêdanên parêzeran dadgeha mafê mirovan hin biryarên balkêş dan, wek mafê darizandina adîlane ku biryara ser mafê hêvî ye,ev her du biryar bi aliyê dewleta Tirk raste rast heya îro jî nehatiye erîkirin. Herî dawiyê serlêdan ji bo komîteya dijî îşkencê a UN ê hate kirin. Lê ez dikarim bêjim saziyên navnetewî bêdengiya xwe ve hevkariya xwe bi dewleta tirk re dimeşînin."

**'Ji bo azadiya Rêber Apo xebatên balkêş hatin meşandin'**

Caniş da xuyakirin ku tecrîda li ser Rêber Apo li ser tevahiya Kurdistanê ye û wiha dewam kir: "Pirsgireka tecrîdê ne bi tenê serê xwe ye û bi pirsgireka kurdistanê ve girêdayî ye. Em nikarin tecrîde bi tenê hildin dest û ger ev yek were çareserkirin pirsgireka Kurd û Kurdistanê wê zûtir were çareserkirin. Di van salên dawiyê seranserê cîhanê kampanyayên wek 'Azadî ji bo Ocalan' hatin meşandin. Her çiqas heya niha negihîşti be asta herî bilind jî xebatên balkêş û giranbaha ne. Di pêşerojê de em ê ji bo berfirehkirina vê kampanyayê xebatan xurt bikin û hewlbidin di nava cîhanê de bidin nişandan. Ji bo şikandina tecrîdê emê têkiliyên xwe li gel sazî û dezgehên hiqûkê de zêde bikin her wiha serlêdanên xwe yên hiqûkî bimeşînin."

Parêzerê Rêber Apo wiha axaftina xwe qedand: "Gelê me bila bizane şikandina tecrîdê û azadiya Rêber Ocalan ji bo Kurdistana azad pêngava herî girînge. Divê herkesek di aliyê xwe de bênavber derdorê xwe rêxistin bike ji bo têkbirina tecrîdê û azadiya Rêber Ocalan, ji xwe re bike karekî esasî."

# KCK: RÊXİSTİNİYA Lİ DORA RÊBER APO MEZİN BİKİN

**Konseya Serokatiya Giştî ya KCK'ê daxuyaniyek weşand û rojbûna Rêber Abdullah Ocalan pîroz kir. KCK'ê bang kir ku rêxistiniya li dora Rêber Apo hîn bêhtir bê mezinkirin.**



Daxuyaniya KCK'ê bi vî rengî ye: "Em rojbûna 74'an a Rêberê xwe bi hurmet, hezkirin û hesreteke mezin pîroz dikin. Rojbûna 4'ê Nîsanê li Rêber Apo, jinan, gelê me, dostên me û li hevrêyan hemûyan pîroz be. Rojbûna Rêbertî ya 4'ê Nîsanê jinûve rojbûna Kurdan e ku navê xwe jî hatibû tunekirin. Ji bo gelê Kurd mizgîniya rojbûneke nû ye. Mizgîngiya wê yekê ye ku xwe jinûve gihand hebûna xwe ya ku ji dest dabû. Mizgîniya jin a azad, mirovên azad, jiyana azad e. Ji bo Kurdan jinûve afirandina derfetên Newrozê ye. Gelekî ku Newroza xwe winda kir, derfetên Newroza xwe jinûve bi dest xist. Ji bo gelekî ku roja xwe ji dest dabû, jinûve bidestxistina rojê ye. Ji bo gelê ku mehkûmê qedera qirkirinê hate mehkûmkirin, bidestxistina şensê rizgariya ji vê qederê ye. Gelê Kurd û dostên wan her sal 4'ê Nîsanê bi coş û moraleke mezin pîroz dikin. Weke rojbûna xwe ya rasteqîn dibînin û bi wateyên nû pîroz dikin.

**RÊBER APO DAWÎ LI BÊRÊXISTINIYÊ ANÎ**

Gelê Kurd, heta pêkhatina Rêbertiya mezin, ji aliyê dijminên xwe ve mehkûmî qedereke qirkirinê ya mezin hatibû hiştin. Di bin zexta qirkirina fîzîkî û çandî de bû. Siyaseteke mezin a înkar û tunekirinê lê hatibû ferzkirin û tenê mafê jiyanê yê li nava sînorên biyolojîk jê re hatibû naskirin. Yanî Kurd bi welat û çanda xwe navê xwe jî ji ser dîrokê hatibû birin. Bê pêşeng û bê rêxistin hatibû hiştin. Rastiya bê rêxistin û bê pêşeng, ji bo Kurdan zemîneke metirsîdar a koletiyê bû. Rêber Apo dawî li vê 'bê rêxistiniyê' anî ku civaka Kurd ji gelekî xwedî nasname hatibû dûrxistin. Ji ber vê yekê jî cihê xwe di dilê gelê Kurd de girt. Di navbera Rêber Apo û gelê Kurd de têkilî û girêdaneke gelekî xurt çêbû. Gelê Kurd bi hişmendiya, civakeke azad tenê bi civakeke rêxistinbûyî dibe, baweriya xwe bi vê yekê anî û kete ser rêyeke ji jiyaneke demokratîk û azad. Lewma tevgera azadiyê ya Kurd daxwaza jiyana azad a gelê me û biryardariya wê heta dawiyê şênber kir. Ji ber vê yekê bi rengekî şênber eşkere bû, ku gelekî biryar li ser jiyaneke azad dabe, ti hêzeke mêtinger a qirker li gel çekên xwe yên mezin û modern nikare jiyaneke koletiyê lê ferz bike. Ji rastiya civakeke bê rêxistinî, bê nasname û kole, rastiya gelekî ya 'Kurdên azad' hate afirandin. Ev sekna Kurdên azad yek ji berhemên sereke yên têkoşîna mezin a Rêber Apo ye. Beşeke ji vê kevneşopiyê ew e ku li her derê bi ruhê seferberiyê dar bêne çandin û xak bê şînkirin. Beşa din jî meşa Amara ya bi heybet e. Lê belê ev ast bi hêsanî bi dest neket. Li gel qedexe û astengiyên rejîma AKP-MHP'ê ya qirker mêtinger, nekarîn ku meşa Amarayê ji rojeva gelê Kurd derxînin. Gelê me di meşa Amarayê de berê 2 ewladên xwe yên hêja şehîd da. Hevrê Mahsûm Karaoglan û Mûstafa Dag ku bûn sembola dilsoziya welatparêziyê ya bi Rêber Apo re, em careke din wan bi rêzdarî û bi minet bi bîr tînin.

Gelê Kurd tevî dostên xwe di Newroza 2023'an de gelek peyam da. Lê belê peyama herî mezin û girîng a qadên Newrozê rakirina tecrîda li ser Rêber Apo û misogeriya azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bû. Weke gel û tevger êdî em nikarin xwe li tecrîda li ser Rêber Apo rabigirin. Di sala 2023'an de armanca me ya bingehîn ew e ku tecrîda li ser Rêber Apo rakin, pêşî li azadiya wî ya fîzîkî vekin. Ji ber ku heta tecrîda li Îmraliyê neyê rakirin di mijara şer û çareseriyê de gavek nikare bê avêtin.

Sekna bi biryar û bi coş a ku gelê me tevî dostên xwe li qadên Newrozê nîşan da, wê di nava perspektîfa rêwîtiya ber bi Rojê ve hîn bi mezinahî dewam bike. Bi biryardarî û armanca rakirina tecrîdê û misogerkirina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo weke tevger em ê ji her demê bêhtir têkoşînê mezin bikin. Li ser vê bingehê em bang gelê û dostan bi taybetî jî li jin û ciwanan dikin ku rêxistiniya li dora Rêber Apo mezin bikin, çalakiyan hîn bi bandor bikin û têkoşînê bilindtir bikin."



# Roksana Mihemed: YPJ`ê vejîna jina azadîxwaz e

Berdevka Yekîneyên Parastina Jin (YPJ), Roksana Mihemed diyar kir ku YPJ'ê ji bo parastina tevahiya jinên herêmê hat damezrandin û bû sembbola jinên azadêxwaz

**Navenda nûçeyan**



Li bakur û rojhilatê Sûrî, jinan bi fikrê civaka demokratîk di bin sîwana YXK'ê de xwe bi rêxistin kirin. Jinan biryar dan ku bibin hêzên parastina jin û gelê herêmê. Lewra piştî li seranserî herêmê tabûrên jinan hatin avakirin, 2'ê Nîsana 2013`an YPJ`ê li bajarê Dêrikê konferansa xwe yekemîn li dar xist û di 4'ê Nîsanê de jî bi awayekî fermî avakirina Yekîneyên Parastina Jin hate ragihandin. Piştî 2013'an Ango di Şoreşa Rojava de jinên şoreşger li Serê Kaniyê li dijî êrîşan, serkeftinên xwe bi destxistin. Herwiha Rola YPJ'ê di şerê li dijî DAIŞ'ê de ya herî girîng bû. Ew jî bi tolhildana jinên Êzdî bû. YPJ'ê ji Kobanê heta Dêra Zorê, tarîtiya DAIŞ'ê têk bir. YPJ, beşdarî pêngavên QSD`ê yên li dijî DAIŞ`ê ku li Holê, Minbicê, Tebqa, Reqa û Dêrazorê dan meşandin bûn. Heta 2019'an jî YPJ'ê li Baxoza Dêra Zorê DAIŞ têk bir .YPJ netenê beşdarî pêngavan bû, lê di heman demê de serkêşiya pêngava rizgariya Reqaya û Dêre Zorê ji DAIŞ`ê jî bûn.

Li gel vê yekê YPJ zêdetirî 3 hezar jin û zarokên êzdî ji 6 hezar û 417 kesên DAIŞ`ê ku ew revandine rizgar kirin. YPJ'ê nasnameya tevhî jinên Cîhanê misoger kir

Di 2018'an de, di êrîşên dewleta Tirk a dagirker li ser Efrînê de jî YPJ'ê berxwedaneke dîrokî raber kir. Weke dewama komploya navnteweyî jî dewleta Tirk 2019'an êrîşî Girê Spî û Serê Kaniyê kir, YPJ'ê weke her carê canê xwe ji parastina xaka xwe re kirin sîper, li wir jî heya dawî têkoşîn kirin. Di vê maratona şer a giran de gelek jinên şoreşger bi têkoşîna xwe bûne efsane û canê xwe fedayî azadiya welat kirin û bûne sembol derketin.

YPJ'ê tevlî operasyona 4`ê Sibatê ya ji bo tolhildana Seida û Hindê ya li dijî şaneyên DAIŞ`ê li çolis-



tana Dêra Zorê bûn. Li gel vê jî YPJ'ê beşdarî operasyona Mirovî û Ewlehiyê ya li kampa Holê jî bû. YPJ'ê bi rihê berxwedanê têbikoşe û soza parastina destkeftiyên şehîdan dide..Piştî Şoreşa Rojavayê Kurdistanê dest pê kir, Jinan di tevahiya qadan de cihê xwe girtin û bûn pêşengên şoreşê. Ji bo parastina jinên herêmê û li ser fikr û felsefeya Rêber Apo Yekîneyên Parastina Jin YPJ'ê di 4'ê Nîsana 2013'an de hat damezrandin. Jinên ku di şerê li dijî çeteyên DAIŞ'ê de cih girtin, ji bo tevahiya jinên cîhanê bûn sembola azadiyê. Herwiha jinan ji seranserî cîhanê berê xwe danê û ew hêz û îradeya xwe dîtin.

Derabrê salvegera damezrandina YPJ'ê, berdevka Yekîneyên Parastina Jin YPJ Roksana Mihemed cji me re axivî. Roksana diyar kir ku rojbnûna Rêber Apo ji bo Jinê vejîna azadî û îradeyê ye û wiha domand: "Rêbertî ji bo azadiya gelê kurd û bi taybet ya jinê li hember serdestî û faşistan serî hilda û bi hêza Gêrîla kete şerê gran. Divê kar û xebatên ku Rêber Apo bi 10`ê salan ji bo jinê kiriye,raneweste û em weke jinên azdîxwaz vî karê bi nirx berdewam bikin. Damezrandina YPJ`ê mercekî bingehîn bû ku ji bo hebûna hêzeke taybet ya jinê be, mafê wê biparêze û ji bo azadiya wê têkoşînê bike ku li Rojavayê Kurdistanê di bin siya Netewa DemoKratîk de bi saya Rêber Apo hate damezrandin."

**'Li tevahiya cîhanê li ser jinan xeter heye'**

Roksan da zanîn ku rewşa jinê bi giştî di xeteriyê ke de y û wiha dewam kir: "Îro pilanên serdest û siyaseta dewletên cîhanê tev li ji bo qirkirin û tunekirina jinê tên pêşxistin, mînaka herî berçav jî rewşa jinên Efxanistan û Rojhilatê Kurdistan û Îranê ye. Divê hemû jinên cîhanê li hember van kiryarên ku dûrî nirxên mirovahiyê tên kirin bibin yek û li ber xwe bidin."

**'Jinên Têkoşer dibin hedefa dagirkeriya Tirk'**

Roksan derbarê xelata Qehremantiya ya ku YPJ'ê ji perlemantoyê Feransa girt wiha got: "Xelata Qehremaniyê ya ku YPJ``ê di 25`ê Adarê de hat xelatkirin weke encam ji têkoşîn û berxwedan ku lehngên YPJ`ê kirin re bû, herwiha bi xwîna jinên têkoşer bû. Ew jinên ku heya dilopa dawî jî ji xwîna canên xwe dane, gelek jin di şoreşa li dijî DAŞ`ê de ji bo parastina gelê xwe û tevahiya mirovahiyê, şehîd bûne. Li hember vê yekê jî dewleta Tirk ya faşist destkdayîna terora DAŞ`ê dikir û herwiha gelek fermardarên YPJ`ê armanc girtine û şehîd xistine. Di roja damezrandina YPJ`ê de, em vê cejnê li Rêberê gelê kurd, jinên azad , Malbatên Şehîdan û tevaya gelê kurd pîroz dikin."

Berdevka Yekîneyên Parastina Jin YPJ Roksana Mihemed axaftina xwe wiha qedand: " Em bang jinên cîhanê dikin ku li ber xwe bidin û li dijî desthilatdariyê serî rakin. Herwiha jî em soza xwe hertim ji Pakrewanên azadiyê re dûbare dikin ku em ê şopdarê vê riyê bin."

# Meşa Amarayê dest pê kir: 4'ê Nîsanê ji nû ve vejîna gelê Kurd e!

**Meşa ku bi wesîleya rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a bi navê "Ji bo Azadiyê ber bi Amarayê ve" tê lidar xistin, dest pê kir. Di meşê de hate diyarkirin ku 4'ê Nîsanê roja ji nû ve vejîna gelê Kurd e.**

Meşa Amarayê ya bi wesîleya rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi dirûşmeya "Ji bo azadiyê ber bi Amarayê ve" di pêşengtiya Kongreya Civaka Demokratîk (KCD), Partiya Herêmên Demokratîk (DBP), Tevgera Jinên Azad (TJA), Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) û Federasyona Komeleyên Piştevaniyê Hiqûqê ya bi Malbatên Girtî û Hikumxwaran re ya Medê (MED TUHAD-FED) ber bi gundê Amara yê navçeya Xelfetî ya Rihayê ve tê lidarxistin dest pê kir.

Tevî hemû astengiyan jî ji Kurdistan û gelek bajarên Tirkiyeyê, gel li xaçerêya Payamli ya li ser rêya Riha-Dîlokê li hev kombûn û dirûşmên weke "Bijî Serok Apo", "Rojbûna te piroz be", "Xeta me Bêrîtane û Rêberê me Ocalan e" û "Silav silav ji Îmraliyê re hezar silav" berz kirin.

**4'ê NÎSANÊ JI BO GELÊ KURD ROJEKE DÎROKÎ YE'**

Hevseroka Giştî ya DBP'ê Salîha Aydenîz li xaçerêyê daxuyanî da û diyar kir ku 4'ê Nîsanê ji bo gelê Kurd rojeke dîrokî ye û got, "Dayik û gelê me yê hêja. Îro rojeke dîrokî ye. Me bi dirûşmeya "Ji bo Azadiyê ber bi Amarayê ve" bang kir. Li ser vê bangê bi hezaran kes ber bi Amarayê ve ketin rê. Li her bajar û navçeyê astengî hatin çêkirin. Tevî hemû astengiyan jî bi hezaran kes em hatin vir."

**'ROJA JI NÛ VE VEJÎNA GELÊ KURD E'**

Aydenîz got, "Em 4'ê Nîsanê tenê weke roja ji dayikbûna Birêz Ocalan nabînin. Roja ji nû ve vejîna gelê Kurd e. Beriya 100 sal xwestin Kurdan bi peymana Lozanê ji dîrokê paqij bikin. Kurdistan kirin çar parçe. Ji kurdan hat xwestin ku ereb, faris û tirk bin, lê 4'ê Nîsanê roja ku kurd ji nû ve ji dayik bûne ye. Ji ber vê yekê Kurd û bi milyonan kesên bi vê baweriyê 4'ê Nîsanê weke roja demokrasî, aştiya bi rûmet û têkoşînê dinirxînin. Yên ku dixwazin çalakiyên vê rojê asteng bikin hene. Yên ku pêşî li kesên ku bawerî bi demokrasî û aştiyê tînin digirin, ji israra birêz Ocalan a aştiyê ditirsin. 4'ê Nîsanê roja ji nû ve hebûn û dîrokî ye. Bi hezaran kes ketin rê û em ber bi Amarayê ve diçin. Tevî hemû astengiyan em ê biçin. Dem dema qebûlkirina aştiya bi rûmet a ku birêz Ocalan daniye holê hatiye. Ji bo ku Tirkiye demokratîk bibe pêwîst e îradeya ku dibêje "hefteyek bidin min ez ê çareser bikim" hembêz bike. Ne ji bo şikandina tecrîda ku veguheriye rejîmê,ji bo azadiya fîzîkî ya Birêz Ocalan em ê li qadan bin. 4'ê Nîsanê li kesên ku aştiya bi rûmet û aştiya hevpar dixwazin pîroz be."



Hevserokê Giştî ya KCD'ê Berdan Ozturk diyar kir ku îro ji bo gelê Kurd, gelên Tirkiye û Rojhilata Navîn gelek bi wateye û got, "Gelê Kurd îro hebûna xwe pîroz dike. Kurd ji rewşa mirinê vegeriya jiyanê. Îro jidayikbûna gelê Kurd e. Roja demokrasi, jiyana wekhev û azad e. Ocalan bû Rêberê hemû gelên bindest. Ramanên wî bû ronahî. Ramanên Ocalan wê dawiya pergala kapîtalîst bîne. Têkçûna dewleta monîst e."

Piştî daxuyaniyê gel bi konvoyê ber bi Amarayê ve bi rê ketin. **ANF**